ÇAWA BAWER BIKIM?

Helbestvanê kurd bû. Helbest dinivîsîn derheqa bedewya qîza kurdda, pesnê wê dida, nîşan dida, wekî ser bengîye, ser wê dişewite. Dergîstya wîye wextekê bûye. Nexwendî bûye, poz pê nekirye, nîşanya xwe paşda hildaye. Qîza kurd mêrkir. Malmêranê wê kesîv bûn. Ew qîza kurd motacê nanê rojê bû, kesîv û belengaz bû.

Helbest dinivîsîn derheqa evîntya xweda, wekî çawa ser qîza kurd bengî bûye, şev-ro xew nakeve ç'evê wî. Ew helbest didane çapkirinê, honorara wan distend, kaka-lolo dikirî, divir dida jina xweye şulet. Qîza kurd bêpar dima, lê jina şulet bi kîsî wê dikir, dixwar, çawa dilê wê dixwest derbaz dikir.

Ezê çawa evî helbestvanî bawer bikim?